# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (217):

## Gundê "Qota" - Dizîn û baceyin, talana werza "mûsima" zeytûna, girtinine bêsûcane, qutkirina darên zeytûnê û şewatin li daristaneke îhracê









غرفة زراعة غصن الزيتون
تاريخ: ٢٠٢٢/٠٩/٢٥
قرار رقم (٥٤)

بناءً على مقتضيات المصلحة العامة ولحسن سير العمل :

- تُحدد رسوم تجديد رخصة تشغيل معصرة زيت الزيتون لعام ٢٠٢٢ بمبلغ / ٢٥٠/ دولار , مئتان وخمسون دولار أمريكي فقط .
- تحدد رسوم رخصة تشغيل المعصرة لأول مرة ولم تكن عاملة في السنوات الماضية أو حديثة الإنشاء ( التشغيل الأول في موسم ٢٠٢٢) بمبلغ / ٨٠٠/ دولار , ثمان مئة دولار أمريكي فقط .

رئيس غرفة زراعة غصن الزيتون

غرفة زراعة منطقة غصن الزيتون
تاريخ : ٢٠٢٢/٠٩/٢٥
قرار رقم (٥٥)

بناءً على مقتضيات المصلحة العامة و لحسن سير العمل .

تقرر ما يلي :

١- على كافة تجار الزيت في منطقة غصن الزيتون الحصول على (رخصة تاجر) من غرفة زراعة غصن الزيتون لتسليم زيت الزيتون لشركة (TARIM KREDİ) .
٢-تحديد رسوم الحصول على رخصة تاجر لعام ٢٠٢٢بمبلغ /٣٥٠/ $ ثلاث مئة و خمسون دولار امريكي .

رئيس غرفة زراعة غصن الزيتون












Milîseyên - Kiwalisyûna Sûrî ya Ixwanî yên bi Turkiyê ve girêdayî, bi malmewdanên xelkê Herêma Efrînê re -weke ku ew di sûdegirtina de yên resen in- didin distînin, ew xwediyan neçar dikin ku belgetekezkirinên malmewdanên xwe pêşkêş bikin, û yê ku nikanibe yan ne li wir be jî, malmewdanên wan dibin xenîmeyên şer -tevî ku milîs bi serûberê xwe ve ji dervayî herêmê hatine- lê rê didin dizîna tiştê bi dest xelkê de maye, û vêrgî û baceyan jî bi şêweyên rengereng û fêlbaziyan ferz dikin...Çetayetî, zorbirin û talan tewanin aşiqaşkere ne.

**Ev jî binpêkirin û tewanin têvel in:**

**= G. "Qota":**

Bi Navça Bilbilê ve girêdayî ye, /22/ KM ji navenda wê dûr e, ji dora /150/ malî pêkhatî ye, dora /800/ nişte ji nişteciyên Kurd ên resen têde bûn, di dema dijberiya ser herêmê de tev penaber bûn, jê dora/120 malbat = 450 nişte/ vegerîn û yên din jî zorane hatin koçberkirin, û dora /30 malbat = 200 nişte/ ji anîndeyan têde hatin niştecîkirin.

Di dema şer de gund rastî topebarankirina Artêşa Turkiyê hat, û di encamê de mala "Ebid El'qadêr Qadî" bi tevahî û du mal bi piçekî hatin roxandin, û ziyanin gihîştin avahiya dibistanê.

Milïseyên "Firqit El'sultan Mûrad" gund desteser dikin, ên ku mala Hemwelatî "Henan qele" li çateriya gund kiriye biryargeh û rêbendeke leşkerî, û mala Dilovanber "Ebdo Ce'ifer" jî biryargeh ji komîta xwe a aborî re.

Û piştî ketina gund, wan piraniya heyînên malan ji xwarinvexwarinê, firaxên baqirî, cerên gazê, alav û amûrên elektirîkê û amûrên taqeta elektrîkroniyê û hinên din dizîn, û herweha jî /5/ giropên zayenda elektirîkê yên ku her yekê jê elektirîk dida giropek ji malan, makîna teqlê (qelab) a "Eslan Ino", makînak Pîkab "Kiya" ya "Şêx Birîm Xelîl", du tirektorên çandiniyê yên "Welîd Bekir Ibrahîm" û "Mihemed Mistefa", guheztok (tirans) û keblên toreya elektirîkê ya giştî, kebil û dîrakên telîfûna zemînî û beşkek ji amûrên stasyûna ava vexwarinê ya gund (avhilkşok - tirumpe, betarî, kebil, tablo...) du cara.

Û "El'firqe" dest daniye ser bêtirî /3/ hezar darên zeytûnê yên hemwelatiyên ne li gund, jê (/300/ ên "Mihemed Bekir Ibrahîm", /500/ jî yên "Bekir Bekir" in); Û ew 50% vêrgiyan li ser berhemdana zeviyine din ên ne li wir ferz dikin, û 10% jî li ser zeviyên ên li wir.

Û wan darên sindiyanê û sinoberê li dor gund û bi taybetî yên di navêna herdu gundên "Qota" û "Bîbaka" de -li ser rûberiya bêtirî /2/ hiktaran- qutkirin.

Û xelkên ku li gund mane jî rastî rengereng binpêkirinan hatin, mîna revandin, girtinên bêsûcane, îşkencekirin, kêmrûmetkirin û peresitandin, jê: Basmîşkirina kargeheke dirûnê li gund - dîrok 22.12.2021an. Z, û lêxistin û kêmrûmetkirina dora /50/ kesên têde; Û giropa dawiyê ji girtiyan li 20.9.2022an. Z bû, û çar jê hatin berdan û yê pêncê jî ta niha bêsûcane bendkiriye.

**= Werza "mûsima" zeytûna:**

Jerkî Efrîn li Avdara 2018an. Z ji aliyê Turkiyê û nandozên wê ve dagîr bûye, ev e werza pêncane, ku li dû hev milîs û destlat heman şêwe û pêngavan bi kar tînin, da ku bêtirîn tibab ji berhema zeytûna -jêdera serekîn a jiyankirina xelkê herêmê- biqoprînin û ji xwe re bibin, zatirê ev bi xwe jî tewaneke şer e.

Dizîn ji zeviyine zeytûna tê kirin berî ku berhema wan bibe, li ber çavên Istîxbaratên Turkiyê û encûmenên xwecihî; Ev ji bilî bizorêbirina berhema bisedhezaran darên zeytûnê yên dest danîne ser, û vêrgiyên ku li ser dora /15/ miliyon dar ferzkirî (50% ji malmewdanên hemwelatiyên ne li wir û 5-20% jî li ser ên li wir), bê ku yek kanibe wê qedexe bike yan jî vêrgiyan nede, û hin caran jî hin rastî lêdan, gef û rûmetdaxistinê tên, mîna:

**-** Dizîna berhema dora /150/ darên zeytûnê li Gundê "Baziya" yên Hemwelatî "Yûsêf Qadêr /60/ sal/Malbata Kumvêlik" ê ku li Bajarê Cindirêsê rûdine, li 27.9.2022an. Z, ji aliyê Milîseyên "Lîwa'i El'semerqend" ve; Ji ber wê jî ew mirovê temenmezin bi seknexwînê ket, wêlomê jî derbas nexweşxanê bû, û du rojan bi hûrgilî tendurustiya wî di bin çavêdêriyê de bû.

**-** Pirbarekirina dizîna berhema zeytûna ji zeviyeke li Başûrê Cindirêsê - desteseriya"Feyleq El'şam"- e Hemwelatî "Ebid El'rehman Mûrad /73/ sal" ji aliyê anîndeyine çekdar ve yen di konine nêzîk zeviyê de rûniştî, û li 19.9.2022an. Z dema ku ew li pêşiya wan sekinî, wî li ser destên wan lêdaneke mekin xwar.

**-** Bi ser wê de jî, "Odeya Çandiniya Şaxa Zeytûnê" li 25.9.2022an. Z du biryar derxistin, a yekê: Nûkirina rêdankên (destûrdan) guvêşgehên zeytûna ji bo sala 2022an. Z neçar dike, /250/ Dolarî li ser her guvêşgehekê û /800/Dolar jî li ser guvêşgeha ku cara yekê tê bikaranîn ferz dike, û biryara dudiyê: Bazirganên zeyta zeytûna neçar dike, ku rêdankên (destûrdanên) xwe yên sala 2022an. Z bidin nûkirin, û /350/ Dolarî li ser her bazirganekî ferz dike, û di gel wê jî dorpêçkirina firotina zêtê di Fabrîka (Tarim Kredi)

de - Hevkariyê Gerantîkirina Çandiniyê ya Turkiyê (Te'awiniyat El'itîman El'zîra'î El'turkiyê), ewa ku nirxên daketî ji zêtê re dîdine.

Û li Navça Bilbilê piştî jiberçavwendabûna "Ebû Osman - El'hedîdî" (yê ji Gundewarê Heleb ê Bakur Rojhilat û serkêşê aborxaneya Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" ê berê) tevî hin endamên xwe li navîna Heyva Rezbera borî, vêca aborxaneya "El'firqe" û serkêşê wê yê nû "Ebû Welîd El'ize" bi lihevpeymanên ku "Ebû Osman" kirine -ên ku beşek ji zeviyên zeytûna yên desteserkirî (dora /45/ hezar dar) ji malmewdanên gundên "Kerê, Eşûnê, Zivingê, Qota, Xelîlaka, Bîbaka, Upila, Kotana, Qaşa, Qurta, Kurzêlê, Çê" bi wekalet an demane dane- mikûr nakin, û ji nû ve dest dîdinin ser tevahiya wan dar û beran, bê ku mafên kesên ku wek alî di wan hevpeymanan de were parastin.

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Li 20.9.2022an. Z, girtina van hemwelatî "Ehmed Reşîd Mistefa /70/ sal, Ebid El'qadêr Şe'iban Seydo /24/ sal, Mistefa Menan Seydo /60/ sal û kurê wî Hemze /27/ sal, Eslan Şe'iban Seydo /31/ sal" ji xelkê G. "Qota" ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîsryên Asyêşa Bilbilê ve, bi tuhmetên pişikdariyê di payandina şevayî li dema Rêvebiriya Xweser a berê de, û piştî ferzkirina /150/ Dolarî weke sezayeke diravî li ser her yekî ji wan li roja din berdan, û tenê "Eslan" bêsûcane bendkirî maye.

**-** Ji du heftan ve, girtina van hemwelatiyan "Umer Mihemed Şe'iban /45/ sal, Mihemed Ne'şet Mistefa /47/ sal, Arêf Mihemed Dehdo /45/ sal" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna", ji aliyê Milîseyên "Asayêşa Reco" ve, bi tuhmetên pişikdariyê di payandina şevayî li dema R.X a berê de, û piştî rojekê û ferzkirina sezayine diravî li ser wan hatin berdan.

**= Qutkirina darine zeytûnê û şewatine daristananina:**

**-** Li vê dawiyê, Milîseyên "Lîwa'i El'weqas" dora /180/ darên zeytûnê yên temenmezin ên hemwelatiyê zorane koçberbûyî "Behrî Cum'e Gedro" li Bajaroka "Kefirsefrê" bi giştî qut kirin, bi bagîrê ji kokê ve hilkirin û erd jî ajotin da ku şop jî werin hindakirin, û êzing jî -yê ku bi kêmanî buhayê her tonekê jê dighêje dora /140/ Dolarî - hatin guhestin.

**-** Li navboriya herdu rojên 24-25.9.2022an. Z, agirin bi daristanin ihracê li nêzîk Gundê "Kaxrê" - Navça Mabeta hatin xistin û rûberiyeke fere şewitand, û "Berevaniya Sivîl li Efrînê - El'dîfa'i El'medenî" tekez kir ku tîpên "tîmên" wê ew agir bi zehmetî vemrandin, û li gor wêneyên ku wê belavkirine, qutkirina fere ya berê ji darên ihracê re ji aliyê milîseyan ve baş diyar dibe, û herweha jî çawabûna bermayên darên qutkirî mîna şênbereke zû êgir hiltîne.

Yaxmekirina malmewdanên "Herêma Efrînê - ya Kurdî ya Sûrî" yên giştî û taybet, gendelîkirina têde û qirkirina jîngehiya wê, berê û ta niha li gor şîret û hêsankirinên "Istîxbatatên Turkiyê", û li ber roniya fetweyên "Encûmena Îslamî ya Sûrî - Istanbûl", bi awakî rêbazkirî tê kirin.

02.10.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Maleke ziyankirî li G. "Qota"- N. Bilbilê, di encama topebarankirina Artêşa Turkiyê de, li Reşmeha 2018an. Z.
**-** Dibistana G. "Qota" ya ku bi piçekî ziyan gihîştiyê.
**-** Herdu biryarên "Odeya Çandiniya Şaxa Zeytûnê" /54/ û /55/ dîrok 25.9.2022an. Z, ên bi taybetiya destûrdankirina guvêşgehan û bazirganên zêtê.
**-** "Ebû Osman - El'hedîdî" yê wendayî û berpirsiyarê berê yê "Aborxaneya Firqit El'sultan Mûrad" li N. Bilbilê.
**-** "Ebû Welîd El'ize" - berpirsiyarê nû yê "Aborxaneya Firqit El'sultan Mûrad" li N. Bilbilê.
**-** Şewatine daristaneke Îhracê li nêzîk G. "Kaxrê" - N. Mabeta, 24-25.9.2022an. Z.